Dema em li birînên xelkê xwe yê Rojavayê Kurdistanê dikolin mirov berxwedan û tehemul û girêdana xelkê me bi ax û gund û welatê xwe dibîne û dema berê xwe jî dide koçberiyê her tiştî dide ber çavên xwe û xwe li mirinê diqelibîne û bi çavên tejî rondik û dilê xemgîn û şikestî mal û mulk û bîreweriyên xwe li şûna xwe dihêle û ji welatê xwe bi bê ku xatir bixwaze bar dike. Çima..!?

daku bikare pêşeroja xwe û zarokên xwe dabîn bike daku bikare şîrê zarokê xwe peyda bike, dibêje qet nebe li Ewrupayê hikûmet dê zarokên min xwedî bike û dê bi xwendin bike, kar hebe tune be ew welat dê nanê min bide, ev ne tenê halê me Kurdan belku mezintirîn koçberiya sedsalê îro li Sûriyê rû daye ku 11 Milyon kes koçber bûne.

Eger mirov ji xwe bipirse gelo xelkê me yê Rojava gênç û keçên me, malbatên Kurd ji ber çi berê xwe didin derveyî welat? Ger mirov pîvanê di navbera herêmên Rojava û herêmên din ên Sûriyê bike, mirov dibîne Rojava ji hemû herêman baştir e, bi berxwedan û zend û bendên şervanên "YPG" û "YPJ" ku bi xwîna wan Rojava ji êrişên hovane ên rêxistina "DAIŞ" û hevalbendên wê hatiye parastin û tê parastinê. Nîşana wê yekê jî berdevkê Koşka Spî John Kirby dibêje, "Kurdên Sûriyê nîşan dan ku di şerê li dijî DAIŞê de pir jêhatî ne, lewma hevpeymanî dê li ser alîkarîkirina wan berdewam be."

Rêveberiya Xweser erkên xizmetguzariyê hildaye ser milên xwe û xizmeta xelkê xwe dikin. Ev yek dijminên Kurdan dîn û har dikin û her roj êrişên xwe li dijî gelê me dimeşînin, dorpêça aborî û siyasetên birçîbûnê li ser gelê me ferz dikin û hewla şikandina vîn û îradeya gelê Kurd li Rojava didin.

Bi dîtina min sedema serekî ya koçberiya ji Rojava nakokiyên Partiyên siyasî ne ku hin alî tenê ji bo bêjin Rojava ne aram e û Rêveberiya Xweser û Asayîşa Rojava û "YPG" û "YPJ" nikare Rojava biparêze û sedema rewşa aboriya xirap û dorpêça ku li ser herêmê heyî û şerê "DAIŞ" li wê yekê vedigerînin. Nabêjin ku sedema serekî ne hevgirtin û ne yekîtî û ji erkê xwe baz dane. Dibêjin ku nahêlin em kar bikin nahêlin em bibin desthilat û çi karekî dinê nakin, ev e hemû hincetên ji kar bazdanê ye ji erkên netewî û xizmeta xelkê reve. Sibê heya êvarê li bajar û kolanên Rojava bi serbestî digerin, civîn û xebatên xwe yê siyasî birêve dibin hîna jî dibêjin Rêveberiya Xweser nebaş e. Ev e bê wijdaniyeke.

Îro di tehdîdên mezin li ser Rojava hene planên mezin li dijî Rojava têne amadekirin û ne opozisyona Sûrî û hevalbendên wê û ne jî rêjîma Sûriyê itîrafê bi Kurdan nakin, divê em Kurd li xwe vegerin û pişta hevdu bigrin û yekîtiya xwe çêbikin û dema roja wê hat û sindoqên hilbijartinê hatin danîn wê demê xelkê hesab bixwaze lê bi siyasetên dijberiyê her kes wê winda bike.

Ewên ku dibêjin koçberiya xelkê ji ber leşkeriya bi zorê ye û siyaseta Rêveberiya Xweser e. wê demê mirov dipirse baş e? Lê bi hezaran ewên ku çek hilgirtine û parastina axa û mal û namûsa me dikin kî ne? Ne ew in keç û kurên Rojava ne. Ma ne ew in ku dengê Rojava li hemû cîhanê belav kirin û berê cîhanê dane Rojava? Ez bawer nakim xort û keçên Kurd ji şer û çekan bitirsin, lê ev rewşa heyî ya neyekîtiya Kurd xelkê ditirsîne û dibe sedema bîngehîn ku dijminên gelê Kurd gefan bixwe û êrişî Kurdan bike. Yekîtî hebûya niha her sê Kantonên Rojava dighîştin hev û Kurd li ser asta Sûriyê bibûna hêza herî bi bandor. Ka em destê xwe bi hev re deynin ser birînê. Yekîtiya xwe xort bikin û bi hev re Rojava biparêzin.

Nakokiya Di Nav Kurdên Sûriyê De

"Qasî ku ez loman li nivîskar û rewşenbîrên me dikim, ez wiqas li partî û siyasetmedarên me nakim. Piraniya rewşenbîr û nivîskarên me xizmetçiyên partî û serokan in".

Salih Bozan

Îro di nav Kurdên Suriyê de nakokiyeke siyasî kûr û dijwar heye. Aliyek partiya "PYD" ye, aliyek partiyên Kurdî yên din in, û aliyê Sêyem Kurdên ne alîgirên van herdu aliyan in. Ez naxwazim li vir ti alî tewanbar bikim. Lê ev nê wateya ku ne kes sûcdar e. Ez dixwazim li bingeha vê nakokiyê bigerim. Ji ber ku a tewre xerab di vê nakokiyê de, ew li dervayî berjewendiya gelê Kurd e. Di gel vê yekê de jî, her aliyek ji van aliyan bi navê gel nakokiya xwe dajo.

Gelo Kî Ji Van Rast e, û Kî Şaş e?

Ku em li gotinên wan guhdar bikin, nivîsên wan bixwînin, em nagihêjin ti encamê. Ji ber ku lojik di van gotin û nivîsan de lawaz e.

Sedemên bingehîn di vê nakokiyê de, gor baweriya min, ev in:

Sedema yekem: Civata me ya Kurdî ji sistema derbegî (feodalizm) hîn derneketiye. Ne ji aliyê aborî de, ne ji aliyê civakî û ramyarî de. Em hîn weke eşîran li xwe û li hev dinihêrin. Nexweşiya civata me ne besî me ye, me nexweşiya civata Erebî jî di mejiyê xwe de rijandiye. Siyasetmedar, nivîskar, rewşenbîr, û oldarên me weke yên Ereb in. Çawa wan civata xwe pûç kir, me jî weha civata xwe puç kir, û pûç dikin.

Sedema duyem: Me Kultûr û zanistiya xwe, ne bi xwe afirandiye. Me piranî ji cîranên xwe yên Ereb wergirtiye. Ji siyasetmedarên wan, rewşenbîr û nivîskarên wan.

Mejiyê me nikare zagonên objjêktiv fêm bike, û li gor van zagonan tevbigere. Ji ber ku ew li dervayî tevgera dîroka nûjen e. Nêrînên me ji gund û bajarokên me derneketiye. Em nikarin ji têgeha herêmî derbasî têgeha netewî bibin. Eynî ku em di demeke nûjen de dijîn, lê nûjenî qalik e, a ne strûktura mejiyê me ye. Ramanên nûjen li cem me tiştekî biyanî ye. Em li Ewropa dijîn, û dîsan mejiyê me herêmî ye. Ramanên me û piraktîkê dûrî hev in. Kurd ta niha ji vî mejî rizgar nebûne, negihiştine hesta netewî ya gelemperî. Partiyên me eşîrên me ne, serokên me, serok eşîr in.

Gava em li ser ramana netewî daxifin, em ya Berezanî ne, ya Talebanî ne, ya Ocelanî ne. Heta rewşebîrên me ji bin konê van kesan derneketine.

Sedema sêyem: nivîskar û rwşenbîrên me nikaribûn ramaneke netewî bafirandana. Ew şîrovekarên partiyan in, siyasetmedaran in, serokan in. Ew bi ramanên xwe li paş siyasetmedaran in. Belam ew li dervayî partî û serokan netewa Kurdî nabînin. Bi gotineke din, ew ne xwedan kesayetiyeke ramyarî ne.

Gava şûna wan di bin her sê konan de dişewite, wê çaxê ew serbixwebûna xwe diyar dikin. Lê di vê serxwebûnê de ew ji nakokiya van partî û serokan dernakevin, ji ber ku ew fêrî ramaneke serbixwe nebûne, heta azadiya ramanê nas nakin û ne karin azad bifikirin.

Di rewşeke weha de, em nikarin berjewendiya gelê xwe bibînin. Em xeynî berjewendiya xwe, weke rewşenbîr, partî, û serok nabînin. Her weha di vê rewşê de, em giş dijminên hev in. Partiyên me dijminên hev in. Rewşenbîr û nivîskarên me djminên hev in, û serokên me dijminên hevdu yên tewre mezin in.

Mejiyên weha ti carî danûstandina zanistî nas nakin, ji ber ku ew hîn dervayî tevgera dîroka niha ne. Karîseta mezin nakokiya di navbera nivîskar û rewşenbîrên me de ye. Ku nivîskarek nêrîn yan berhemên ê din rexne dike, ew deriyê kunemozê li xwe vedike. Weke dîkan radibin hev, destê xwe dikin qirikê hev, hevdu riswa dikin, û li dawiyê bi xiyaneta bi dijmin re hevdu tewanbar dikin.

Qasî ku ez loman li nivîskar û rewşenbîrên me dikim, ez wiqas li partî û siyasetmedarên me nakim. Piraniya rewşenbîr û nivîskarên me xizmetçiyên partî û serokan in. Ew rola kultûr û rewşenbiriyê di civatê de fêm nakin. Li cem wan Kurdewarî tu bi serok re bî. Ta niha ew nikarin di bin komeleyekê de bicivin. Her çendekan komeleyek ji xwe re ava kiriye, û bê fedî bangewaziya yekitiyê dikin.

Civata ku rewşenbîr û nivîskar azadiya ramanê fêm nakin, ew civata ti carî nagihêje azadiya xwe.

Gelo Wê Çarenûsa Koçberan Çi Be?

Dilovan Çeto

Nayê veşartin, ku şer û pevçûn li kîjan devera cîhanê biqewimin bi tevayî, astengî û pirsgirêk derdikevin holê û hem welatiyên wî welatî qiriktehliyê dixwin, û jiyan li wan dibe dojeh!.

Rojavayê Kurdistanê jî îro roj ketiye vî warî, û şîniyên deverê ne tenê astengiyên jiyana rojane dikşînin, mîna kêmbûna av, elektrîk, nan, û buhabûna pêdiviyên jiyanê, lê belê tiştin balkêş û xerab di civaka xelkên Rojava de bi tevayî û bi taybet gelê Kurd têne kirin.

Ji van bûyeran ez dixwazim tenê li ser babeteke giring û balkêş biaxivim ku bûye despêka diyalog û galgala her civatekê li Rojava.

Diyardeya koçkirina malbatên Rojava bûye bûyerek normal û lezgîn, ta gihiştiye radeyekê ku dê û bav ji metirsiya girtinê yan jî kuştinê ji zarokên xwe dixwazin baz bidin û bi welatên xerîbiyê bikevin, rêjeya koçkirinê mixabin roj bi roj ber bi zêdebûnê ve di çe. Li aliyê din hin kes hene ku bi axa xwe ve girêdayî mane û destê wan ji welat nabe, lê dimîne metirsiya paşeroja zarokên wan û bi taybetî xwendina dibistan û zanîngehê.

Kesên bi vê nerînê re dikevine navbera "Xelîl û Celîl", eger li welat bimînin, ji bilî zordariya rojane û astengiyên jiyanê nabînin, li ber çavan diyar dibe nexweşiyên xwendinê û pirsgirêkên ku têne pêşiya şagirtan li dibistan û zanîngehan û encama wê ewe têkçûna xwendinê û paşeroja zarokan e, û eger bixwazin koçber bibin yan jî bi kêmanî çend salekî dûrî van aloziyan bikevin û piştî aramî û hêminî vegere welat wê çaxê dikarin vegerin û ew tirsa li ser paşeroja zarokan namîne.

Li vir pirseke giring xwe davêje meydanê; gelo ev malbatên ku koçberî welatên xerîbiyê ketin û di xewnên wan de heye vegerin welat piştî şeş heft salan, çarenûsa zarokên wan wê çi be??

Eger em werin malbatekê hilbijêrin ji xelkên Rojava wek nimûne (dê û bavek û çar zarok) û paşê berhevkirinekê bikin bê encam çi ye.?

Di vê malbatê de çar zarok hene, yek pola pêncemîn e, yek heştemîn, yek zanîngehê dixwîne û yek jî di ayîngehê de ye.

Eger ev malbat koçber bibe bi omîda vegerê li welat piştî çend salan, em ê werin li çarenûsa van zarokan meyzînin. Li despêkê dema ku ji welat bar kirin, xwendina wan ya li dibistanên Rojava ku bi zimanê Erebî perwerde dibûn, wê were jibîrkirin û bê viyana wan wê ji dibistan û mamosteyên xwe û hevalên xwendinê qut bibin.

Ji hêleke din ve eger bi serbestî gihiştine welatekî Ewropî û li wir cih bigrin, wê çaxê eger derfeta xwendinê ji zarokan re derkeve bi kêmanî du sal divin hetanî fêrî zimanê nû bibin, paşê wê herin dibistanê û jiyaneke nû ligel heval û wê bi zimanekî nû destpê bikin. Hêdî hêdî ev malbat wê fêrî jiyan û kultur û zimanekî biyanî û nû bibin, li hemberî wê û bi taybetî zarok wê jiyana bûrî jibîr bikin, mixabin!.

Em ê vegerin pirsa xwe û hewl bidin bersiva wê bidin. Piştî jiyaneke xweş li Ewropayê û piştî şeş heft salan û kêşeya xwendina zarokan, qutkirin ji welat û windabûna salên bûrî, û avakirina jiyaneke nû di gel ziman û heval in nû, ma wê vegera wan zarokan hesan be gelo..?!

Bêguman zarok nema vedigerin welat û dê û bav wê qiriktehliyê bixwin û ew jî venagerin ji bo zarokên xwe û di encamê de êdî malbatek ji şeş kesan ji qurm ve hat biriîn.!!

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Rewşen Bedirxan (Jiyan û Berhem)
(1909-1992)



- Kurê min, yekîtiya Kurdan bide min, ez ê Kurdistaneke azad bidim te.

- Kurê min dema em hebûn, hûn negiha bûn; îro hûn giha ne; lê mixabin em nema ne. Kurê min, ji hev hez bikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin kurê min, belawela nebin.

- Gelek jin hene bawer dikin ku rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne wa ye. Sea'det û bextiyarî ne ji dewlemandan bi tenê re ye. Xincîkên belengazan hene ku sea'det û bextiyarî, ji qesra dewlemendan bêtir û çêtir tê de qerar digirin û bi rihatî cih dibînin.

*Dilawerê Zengî

Piştî têkçûna Sultan Ebdulhemîd û di sala 1908an de hatina Sultan Reşad, rewşa azadiyê pêş ve çû û azadî ji girtiyan re derket. Di wê demê de, Salih Bedirxan deh salên xwe di girtîgehê de buhurandibû. Bi wê azadiyê re ew ji zindan û girtina timî (muebed) reha bû û ew şandin bajarê Qeyseriyê.

Di roja 11-ê meha Tîrmeha sala 1909an de Sultan Reşad hat ser hukum. Di wê rojê de Xwedê keçek da Salih



Bedirxan. Ew keç bixwe Rewşen Bedirxan bû. Piştî ku du salên Rewşenê li Qeyseriyê qediyan, malbata wan hatin Stenbolê; li wir gelek ji malbata Bedirxaniyan hebûn.

Salih Bedirxan ji Stenbolê jî berê xwe da riya Şamê. Bavê Rewşenê tucar nedisekinî û bi hêz û bi hunera xwe ji bo miletê Kurd dixebitî, li xweşî û kêfa jiyanê nedipirsî. Ew li mal û li nav û deng jî nedigeriya.

Salih Bedirxan gelek nivîs di kovar û rojnameyan de çap dikir. Daxwaza wî ya yekemîn, di jiyanê de hişyarkirin û bi pêşxistina miletê wî bû. Ew bê westan, şev û roj li kar bû.

Salih Bedirxan piştî hatina xwe ya Şamê çendekî bê kar ma. Di vê navê

de şerê Cîhanê yê Yekemîn derket; mercên jiyanê pirr dijwar bûn. Ji bêçarî berê xwe da kar û li zindana Keleha Şamê kar kir. Lê mexabin bi êşa tîfoyê ket; pirr dirêj najot, di 30yê Adara 1915an de mir. Di wê demê de temenê Rewşenê negihiştibû şeş salan.

Piştî mirina Salih Bedirxan diya Rewşenê ew şand dibistanê. Rewşenê piştî ku dibistana seretayî xelas kir çû dibistana mamostetiyê (Dar El-Muelîmat) û ew jî bidawî anî. Rewşen bû mamoste û ji nifşên sêyemînên ku li Sûriyê dibistana mamostetî qedandibû tê hejmartin.

Rewşen Bedirxan di sala 1925an de diçe bajarê Kerkê (li Urdun) û li wir dibe berpirsiyara dibistanê.

Li Urdunê bêdeng namîne bi pênûseke bilind li ser doza Erebî û rewşa Sûriyê û bûyerên wê demê gotarên xwe di çend rojnamên Felestînî, Urdunî, Libnanî û Sûrî de belav dike. Mîna rojnama "Minîrva, Mirat el-Şerq, Nîdal, el-Şe`ib, Huriye û Wijdan. Hêja yî gotinê ye ku xwediyê herdû rojnaman: Wijdan û Huriye rojnamevanê gewre Yûsif Melek bû. Ev rojnamevan dostekî dilsoz û piştgirê doza Kurdan bû. Gelek belge û nivîsên hêja li ser Kurd û Kurdistanê belav kiriye.

Di sala 1928an de vedigere Şamê, dibe mamoste û berpirsiyariya (kargîra) gelek dibistanan dike.

Di sala 1934an de dibe endama komeleya Yekîtiya Jinan li Sûriyê.

Di roja 22.2.1935an de bi Mîr Celadet Bedirxan re hevjîn dike. Bi navên Sînem 21-3-1938an û Cemşîd 9-11-1939an keç û lawek ji wan re çê dibin. Berî ku Rewşenê lawê apê xwe Celadet bike mêrekî din "Omer Malik Hemdî" kirbû û keçek bi navê "Useyme" jê anîbû. Rewşen Xanim bi qasî ku li dibistanê mamoste bû, ewqas jî di xwedîkirina zarokan de mamoste bû. Diyeke dilsoz û dilovan bû.

Di sala 1944an de li ser navê jinên Sûriyê, li Misrê beşdarî Kongra Jinên Cîhanê bû. Jiyana Rewşen Xanimê a niştimanî pir berfireh û kûr e; ew bi hemû hêz û ramana xwe li dijî Qolonyalîzma Fransa sekinî û piştgiriya doza Erebî kir. Bi taybetî jî wê doza gelê Filîstîn parast û wê di dibistanên Ereban de mamostetî kir û gelek nivîs û gotar di kovarên Erebî de weşand.

Di rojnama "Wijdan" hejmar -331-ê de, di gotarek xwe de bersiva nivîskarê mezin "Circî Niqola baz" dide. Ew ê ku ji piştgiriya Rewşenê bi doza Felestîn û Sûriyê re matmayî maye û dipirse gelo Rewşenê Çerkes an Ereb e?. Rewşen Xanim bersiva wî weha dide: "Ez bixwe, bi xwîn û canê xwe Kurd im. Lê berî her tiştî ez mirov im. Dema ez li ser mafê miletan dinivisînim mirovatiya xwe di bîra xwe de tînim û wê jibîr nakim. Çawa azadiyê ji miletê xwe re dixwazim wehareng e ji hemû miletên bindest re dixwazim. Ew kesê êş û derdê bindestiyê ditibe, nikare setemkariyê ji miletên dî re bipejîre. Ez bawer im mirovê birçî be bi hevalê mîna xwe haydar e. Eger azadîxwaza gelê xwe me, bawer bin ne mafxura mafê tu kesî me. Azadî û serbestiya gelê min ne li ser rûxandina berjewendiya tu gela ye. Armanca min ev e ku miletê min jî mîna hemû miletên serdest bi serbestî û azadî bijî".

Di pertûka herdû nivîskaran "Merwan El-Mesrî û M.Elî Elanî de ya li ser jinên nivîskarên Sûrî (1892-1987)-an de pir bi dewlemendî û şanazî li ser Rewşen Bedirxan nivîsandine û pesinandine.

Jiyana wê ya niştimanî gelek giranbuha ye; cihê serbilindî û mezinahiyê ye. Di gel ku Rewşen Xanim mamoste bû, xebata wê di behsa zindanan de, ji bo rastkirina tenduristiya keç, jin û pîrekên bê sincî yê di zindanan de jî hebû. Bi aramî û bîhinfirehiya xwe dest davête hemû aloziyên jiyanê. Lewra quretî û

serşorî di ferhenga jiyana wê de nebû. Jîna Rewşen Bedirxan neynika jîn û danûstandina Mîrê gewre (Mezin) Celadet Bedirxan û malbata Bedirxaniyan bû. Ew xeleka gihandina dîroka miletê xwe ya kevn û nû ye. Ew dîroka lehengiyê ya dûr û dirêj a ku bav û bapîrên wê bi sedan salan ji bo Kurdistanê kirine. Jiyana wê ne kêmî jiyana bav û kalên wê bû. Nemaze di warê dijwarî û zehmetiyan de piştî mirina mêrê wê Celadet Bedirxan di 15-7-1951an de.

Dibêjin li piştî her mêrê gewre(mezin) jinek gewre heye. Belê Rewşen piştevana mezinahiya mîrê ronakbîran Celadet Bedirxan bû. Piştevana amadekirina kovar, pirtûk û hemû afirandinên mîr bû. Digel xebatên hêja ew ê bixwe jî di kovara Hawarê de dinivîsand. Bêdirû, em dikarin bibêjin Rewşen Bedirxan pîreka Kurd ya pêşî ye ku bi zimanê Kurdî-Latînî di kovara Hawarê de nivîsiye û çend gotarên taybet li ser rewşa jina Kurd afrandiye. Rewşen Xanim di kovara Hawarê hejmar 27an de, di nivîsek xwe ya bi navê Kebanî û Mamoste de weha dinivîse: (Mêrên ku qedera miletan di destên xwe de dibin, li ber destên jinan xwedî dibin. Terbiya xwe dielimin, heta axa gorinan ji bîr nakin û ew tim û tim li wan hukum dikin. Ji lewre methelokê gotiye: 'Kurmê şîrî heta pîrî'). Rewşen Bedirxan karê jina Kurd netenê kebanî û xwedîkirina zarûkan dibîne, li ba wê karê jinan ê giring li dijî nezaniyê şerkirin û perwerdekirina zarokan e.

Bêguman di vê xebata perwerdeyî de rolê welatperweriyê jî ji bîr nake. Rewşen Bedirxan bi dengekî bilind û zelal ewha bang dike: (Xwehên min ên delal, herwekî hûn jî dizanin derdê miletê me yê mezin û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik miletên xwedan hukumat û teşkîlat vê nexweşiyê di xestaxaneyên xusûsî de derman dikin û ji wan xestaxanan re dibêjin dibistan. Mamoste bijîşkên wan xestaxanan e).

Em dikarin bibêjin ku Rewşen Bedirxan, bi xebat û nivîsên xwe di pirsa jinan de çalakiyên hêja daye. Rewşen Bedirxan di gotarek xwe de di hejmara 28an a Kovara Hawarê ya bi navê (Jin û Bextiyariya Malê) de ewha dinivîse; (Gelek jin hene bawer dikin ku rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne wa ye. Sea'det û bextiyarî ne ji dewlemandan bi tenê re ye. Xincîkên belengazan hene ku sea'det û bextiyarî, ji qesra dewlemendan bêtir û çêtir tê de qerar digirin û bi rihatî cih dibînin).

Rewşen Bedirxan dixwaze vê yekê bi jina Kurd bide zanîn: xweşî û bextiyarî ne pere û qesr û qonax in; belê xweşî ew e gotina xweş, danûstandin, kar û xebata ku mirov ji milet û welatê xwe re bike. Xweşiya jiyanê ya bi peran diqede lê xweşiya jiyanê a welatperwerî û zanînê naqede.

Her giringiya rola jinê û rizgarbûn û pêşveçûna wê di civakê de pêwîst didît. Di jiyanê de, jin kok û bingeha dibistana pêşî ye, li ser wê bingehê civak tên avakirin. Kurdan berê gotiye: 'Kurmê şîrî heta pîrî'. Gelo ew çi nifşên xwendevan û şagirtane ku ji dibistaneke bê bingeh û herifandî bêne der!!. Rizgarkirina jinê, rizgarkirina civakê ye.

Pêşiyan berê gotiye: Jin keleha mêranê. li piştê her mêrê gewre jinek gewre heye. Jin jiyan e, Ji dibistana jinê hemû mirovên zanyar, ronakbîr, bijîşk, parêzer, padîşah û fermandar perwerde bûne.

Ji bilî nivîsîna bi zimanê Kurdî, Rewşen Xanimê bi zimanê Erebî jî gelek nivîsar li ser Kurdan belav kiriye. Rewşen Bedirxan di sala 1971an de beşdarî Kongra Sêyemîn ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê (li Başûrê Kurdistanê) bû û bi piştgiriya xwe serketina wan parast. Di eynî salê de rûmeta endamtiya Korî Zanyarî Kurd girt û di wê demê de li ser daxwaza Korî Zanyarî Kurd çû Stenbolê. Ev çûna wê ji bo komkirin û civandina destnivîs û pirtûkên ku di arşîv û pirtûkxaneyên Tirkan de, yên ku li ser Kurdan e bêne civandin û ji Korî Zanyarî Kurd re bêne rêkirin bû. Bi rastî jî ev layiqî pe-

sindanê ye ku ew di vî karê xwe de bi zanebûn û bi bêdengî bi ser ket.

Rewşen Xanimê di sala 1956an de, digel Dr. Nûrî Dersimî, Hesen Hişyar, Heyder Heyder û Osman Efendî li bajarê Helebê Komela Zanistî û Alîkariya Kurdan damezrandin.

Rewşen Xanim bi bîhinfirehî û aramiya xwe li dijî hemû alozî û dijwariyên jiyanê bi ser diket.

Jiyana mirovan bi salan nayê jimartin; ne jî bi mal û milkên ku mirov li dû xwe dihêle. Jiyan bîranîna şopeke kamûranî, qencî, comerdî û mirovatiyê ye. Nemaze ji bo mirovên xwedî berhem, şop, têkoşîn, xebat û kar e.

Ji ber vê yekê ez dikarim bibêjim ku Rewşen Xanim nemiriye; ew ji me haydar e û em jî pê haydar in.

Herçiqas wê di roja 01.06.1992an de ji nav me koç kir ew di dilê me de dijî. Heta roja mirinê jî ew ji bo gel û welatê xwe xebitî.

Rewşen Xanim di doşeka mirinê de ew tişt ji min re digot: (Kurê min dema em hebûn, hûn negiha bûn; îro hûn giha ne; lê mixabin em nema ne. Kurê min, ji hev hez bikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin kurê min, belawela nebin).

Piştî ku ez hinekî li ser rewşa Kurdistana Başûr û li ser hilbijartinan sekinîm, Rewşen Xanimê gotina min birrî û ewha got: (Kurê min, yekîtiya Kurdan bide min, ez ê Kurdistaneke azad bidim te).

Piştî ku Rewşen Xanimê canê xwe spart Xwedê, -Li ser daxwaza wê û li gor sozê ku min pê re dabû- min karûbarê veşartina wê kir, û min cendekê wê ji bajarê Banyasê anî bajarê Şamê li tenişta mêrê wê Celadet û bapîrê wê Bedirxan Beg li goristana Şêx Xalidê Neqşibendî veşart. Piştî ku li mizgefta Hemo Leyla li Taxa Kurdan li ser cendekê wê limêj kirin, merasîmên veşartinê bi beşdariya gelek ji dost û nasên malbata Bedirxaniyan û nivîskar û rewşenbîran destpê kir. Ji ber rewşa Kurdan ya dijwar û awarte û li ser daxwaza keça wê Ûseyme Xanimê kesekî tu gotin û tu helbest li ser gora wê nexwendin.

Ev e Rewşen Bedirxan, ya herdem wekî bav û kalên xwe êşa miletê xwe dikişand û qet ji bîr nedikir. Wê mezinahiya xwe ji stûnên Birca Belek girtibû. Rewşenbîriya xwe ji dibistana Sor, ji kaniya Cizîrî û Xanî wergirtibû.

Berhemên Wê Yên Çapkirî Ev In:

1-Bîranînên Jinekê, Daner: Gozîda Sebrî, werger ji zimanê Tirkî bo Erebû, 1951.

2-Xeramî We Alamî, Daner: Mukerem Kamil, werger,(çîrok) ji Tirkî bo Erebî 1953.

3-Bîranînên Mamosteyekî (sê pirtûk), Daner: Reşad beg Nûrî, werger, ji Tirkî bo Erebî 1954.

4-Rûpelên Ji Toreya Kurdî -1954.

5-Nama Gelê Kurd (helbest-Goran) ji Kurdî bo Erebî 1954- ji ber rewşa siyasî navê xwe li ser vê pertûkê ne nivîsî ye.

6-Name Ji Mustefa Kemal Paşa re, werger ji Tirkî bo Erebî (Ev pirtûk bi alîkariya min hat nivîsîn, çapkirin û belavkirin).

7-Bîranênên Min-Salih Bedirxan-,werger ji Turkî bo Erebî. (Ev pirtûk jî bi alîkariya min hat nivîsîn, çapkirin û belavkirin).

8-El-red 'ele El-kosmopolîtiye, Mehmûd Şîniwî, werger, (ji ber hin sedemên siyasî navê xwe li ser vê pertûkê ne nivîsî ye).

9-Mîr Bedirxan, perçak ji pirtûk Lutfi ye.lêveger, sala:1992-an. Libnan.

10-Bîranînên Jinekê (perçê duwemîn). Ev pirtûk li Şamê-sala: 1996-an li çapxana Dar Alai hate çapkirin.

11-Rapora Mufetişê Turk ê el'am-Abdîn Osman-konevaniya Turkirina Kurdan. (23) rûpel e, di rojnama (Wijdan) de hatiye belavkirin. Werger ji zimanê Turkî bo zimanê Erebî. Sala:1956-an. Hejmarên taybet: (303-306-314-bê hejmar).

12- Nerînek Li Dîroka Osmaniyan, ya nivîskar Dr.Nûrî Dersimî, werger, ji Turkî bo Erebî. Min jî di rojnama El-Hîwar de da belav kir.

13-Celadet Bedirxan wek min naskir. Mexabin berî ku bidawî bike mir. Min jî di rojnama El-Hîwar de da belav kir.

Pertûkên Wê Yên Ne Çapkirî Ev In:

2-Bavê Min Abdulhemîd-nivîsa Ayşe keça Sultan Ebdulhemîd e.

3-Bîranînên Min. Destnivîs e.

Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Pisîkê Cînarê Me

Şahîn Bekir Soreklî

Pisîkê cînarê me li pêş deriyê me ye. Dema dêrî vedikim xwe li pêş dêrî li ser piştê vedixe û ji min divê ku zikê wî yan bin stuyê wî bixurînim. Navê pisîkê cînarê me Jimmy ye. Zengilekî biçûk yê bi stuyê wî ve bi benekî zirav hatî girêdan, mirovî haydarê hatina wî dike; cînar hemî wî dinasin.

Li welêt pisîkên me yên salên zarotiyê ne weha bi nerx bûn; ya rast me nerx nedida wan. Pisîkên me, wekî ez di nav hewzê rojên zarotiyê de bi bîr dihînim, her ji ber me direviyan. Ji ber ku xwarina pisîkan her kêm bû, ew neçar diman xwarinê bi şêweyên din bi dest xin. Bi encamê xwediyên malan didan şopa wan û ew wek dizên şerpeze direviyan. Ma gotina "Reva pisîkê ta kadînê ye" hema wilo ketiye nav çanda Kurdan! Erê, pisîkên me yên birçî û bênerx neçar diman vegerin sinçiyê nêçirvaniyê; û dema wan çêlîkên kurkan dixwarin fermana mezinên me li dij wan gurr dibû. Carine gundiyan pisîkek digirtin û dixistin nav çiwalekî, dibirin li şûnên dûr yên vala çeng dikirin. Carine jî pisîka di nav çiwêl de bi ço dikuştin.

Me zarokan ji çêlikên pisîkan hez dikir, bi wan re dileyizt û heta carine nan û şîr jî dida wan. Dema mezin dibûn dostaniya me ji navberê radibû, wekî dostaniya me ya bi berx û karan re.

Me gellekî ji berx û karan hez dikir. Di stranên me de, dayan zaroyên xwe û evîndaran hezkiriyên xwe wek "Berxê/Berxa min" bi nav dikirin. Dema berx û kar mezin dibûn ew yan bi kêrê dihatin serjêkirin, yan jî li mezatên bajaran dihatin firotin. Dostaniya bi keçan re jî kêm-zêde weha bû. Çaxa biçûk bûn bav û biran ew hembêz dikirin, radimûsan, digerandin û bi wan re dileyiztin. Dema mezin dibûn ew nêzikiya ji navbera wan radibû, şûna wan êdî li aliyê jinan bû. Tenê bo xizmetkirina bav û biran diçûn odeya peyan, ger kesekî namo (xerîb) nebûya. Odeya gundan ne şûna keçan bû, tenê peya li odeyê dihatin dîtin. Me bi xwîşkên xwe yên berbext re nedilîzt, ne jî me bi dirêjî ligel wan diaxift. Bi kêmasî dema zarotiya min weha bû.

Çawa ku sêwiyek xweziya xwe bi kesên xwedan day dihîne, ez jî xweziya xwe bi wan kesan dihînim ku di rojên zarotî û ciwaniya xwe de bi xwîşkên xwe re têr axaftine, ew baş nasîne û piştgirî li meraq û daxwazên wan kirine. Hele tew keçên xalan, apan, xalitiyan, metan, û keçên cînaran! Nêzikbûna ji wan û axaftina bi wan re hemahema qedexe bû. Ger ne qedexe bûya jî, me li xwe qedexe kiribû, yan nedizanibû em ê bi wan re li ser çi bipeyivin. Tiştê seyr, yê mathîştinê, ew e ku kesekî dan-û-stendina bi wan re bi şêweyeke aşkere berbend nekiribû; kesekî negotibû, Filano, tu dê ligel filanê neaxafî; yan filankesê, tu dê ligel filankesî nepeyivî. Kesekî/kesekê negotibû axaftina filan kesî û filan kesê bi hev re qedexe ye. Lê erf û toreyên me xwe xistibûn nav xwîna me. Çanda me wek kirasekî xwe li me kiribû, em ji her shêweya têkiliya bi kesên mê re ditirsiyan. Xwerista me ya herêmî em ligor xwe "terbiya" kiribûn.

Belê, pisîkê cînarê me îroj ne tenê pisîkên rojên zarotiyê bi bîra min dihîne, lê gellek kes û tiştên din. Lewma ez bi Jimmy re dipeyivim û wek mêvanekî delal pêşwaziyê lê dikim. Jimmy pisîkekî serbilind e, nahêle kesek bi lingên xwe zikê wî bixwirinî. Mirov dikare tenê bi destan wî bixwirîne, yan na: hêrs dibe. Xwarinê jî ji cînaran nagire. Tenê xwarina ji xwediyên xwe dipejirîne. Berê bi carekê ve tiştek ji dest min nedigirt, lê nuha em êdî dost in. Ger xwarina bidimê goştê li keyfa wî be dixwe, bi rêzgirtin û wek zarokekî "terbiyakirî" dixwe.

Xweragirî Di Civak û Wêjeya Kurdî De

Evîn Şikakî

Civaka Kurdî civakeke pêşketî û xweragir e, herwiha civakeke zengîn û dewlemend e, ji dastanên gelêrî yên ku tê de qehrmenî, xweragirî û berxwedana gelê kurd di dirêjahiya dîrokê de nîşan dide.

Rewşa ku niha civaka me ya Kurdî tê de derbas dibe rewşeke pir xirab e, dijminên kurdan bi hemû hawlên xwe dixwazin ku miletê Kurd tune bike û mafê gelê Kurd binpê bikin, lê weke di serî de jî min behs kirî civaka Kurdî civakeke têgihştî û xweragire dikare her dem li ber xwe bide, herwiha rih û giyanê xwe qurbana mayîna xwe bike.

Serkirdeyên kurd, siyasetmedarên gelê Kurd, rewşenbîr, hemû stêrkên ku herdem simbola berxwedanê bûn hestê netewî û kurdperweriyê li cem gelê kurd gur dikirin herwiha berzî û bilind dikirin, bêguman ev yeke ne tenê erkê siysetmedar û rewşenbîran bû, lê belê yê nivîskar û helbestvanan jî bû, ku di rêya helbest û nivîsên xwe de civaka kurdî bihêz dikirin û girêdana wan bi xaka Kurdistanê ve xortir dikirin. Herwiha yekrêzî û yekgirtina miletê Kurd dixwestin.

Weha diyar e ku ji kevin ve heta weke îro wêjeya berxwedaniyê nemaze helbest roleke mezin û sereke di bizava bergirî û xweragiriyê de kiriye di nav wêjeya cîhanî de, herwiha di nav civak û wêjeya Kurdî de jî.

Em dikarin bibêjin ku helbesta berxwedaniyê xebata hişyarkirina hizra neteweyî û azrandin û raperîna hestê xweragiriyê bilind dike, Seyadê Tîrêj ji wan Helbestvanên ku bi zimanekî şêrîn û zelal ev babet anî ziman.

Seydayê Tîrêj bi germî behsa yekgirtin û yekrêziya miletê Kurd dike, herwiha daxwaz dike ku ew bi hev re yek helwest bin, xebat û bizavê bikin berxwedanî û berevaniyê ji mafaê xwe yê rewa re bikin vê yekê weha tîne ziman û dibêje:

Destan bidin hev de bes e êdî bibin yek
Kok hatiye ber kaşo divê ku em bibin şek
Dijmin bela we îro ji hev nexe yeka yek
Li ber we kes xwe nagre ne axa ne jî beg

Helbestvanê me her dem amade ye ku canê xwe bisojîne da bostek axa welatê xwe bernede, herwiha hemû alîkarî û şiyanên xwe bike da welatê xwe biparêze û ala rengîn bilind bike dema Seydayê Tîrêj dibêje:

Can bisojim dê bi pêt û agirê cenga welat
Agirê Zerdeşt bê ez bi xwe perwanê te me
Bostekî ez ji te nadem bi welatê Hind û Çîn
Ala rengîn jor ve hildem ez li ser banê te me

Ji ber ku Seydayê Tîrêj xwe yek ji helbestvanên di gulistana helbesta berxwedaniyê de gelek kulîlkên rengîn çandine, êş û azarên miletê xwe aniye ziman, ne tenê ev yeke lê belê Seyda danpêdanê bi helbesta ku pesnê welat nede nake ji ber ku ew dibîne pêwîst e helbest xizmeta milet bike di vî warî de Seyda dibêje:

Ma rûmeta şi'rê çî ye ne di xizmeta millet da bî
Ronahiya şi'rê çî ye pesnê welat ku tê da nebî.
Çi bikim ji wê şi'ra rizî da negre sewda û mejî
Derdê dil û can nakujî çaxê ku cewher têda nebî

Herwiha di helbesta bi navê (Ey welat) Seydayê Tîrêj xwe ji deşt û zozanê welat re qurban û canfîda dike bi germî û bawerî tîne ziman ku çiqasî ew evîndarê welat û miletê xwe ye, herwiha soz û peymanê dide ku ewê bi xwîna xwe berevaniyê ber xaka welatê xwe de bike dema dibêje:

Ey welat ez canfidayê deşt û zozanê te me
Canfidayê av û dol û bax û bostanê te me
Sond û peyman bî li ser min dê te parêzkim welat
Xwîna narincî birêjim merdê pîwanê te me

Niha pêdiviyek mezin heye ku hemû nivîskar û helbestvan xwe bavêjin meydana civaka Kurdî, û ji civaka xwe dûr neçin, û ji êşa gelê xwe re di vê qonaxa hestiyar binvîsin çax çaxa belgekirin û nivîsandina destanaye.

Rewşa Civaka Kurdî

Gava ku merov li jiyana gelê Kurd di rewşa niha de dinere û tê de dirame, merov pir dijwar dibîne, çawa gel dikare jiyana xwe ya rojane di vî nîrê dijwar de berdewam bike?

Tê bîra me tevan berî pênc salan çawa jiyan bi awayekî pir hêsan û bi biratî û xweşî pêş ve diçû, bê astengî sînor û sênc, çawa ku merov dadiket celdan û bazaran merov bi kêf û şadî pêrgî heval û dost û hogirên xwe dihat. Her pêlekê me simîner û civet çê dikirin, her dem em bi kêf bûn. me her û her lêborîn ji hev dixwest, lêborîna hev qebûl dikir, me gelek caran radihişt barê hev da ku em barê ser milê hev sivik bikin, me hevdû himbêz dikir, pîroz dikir, bi germî pêşwaz dikir, me ji hev hez dikir, riya çê dida ber hev, û ramanên hev qebûl dikirin, em li ser nerînê hev radiwestiyan, şaşitiyê hev rast dikirin, erzanî hebû, piranî hebû, pirê cara wekhevî bû. Lê mixabin gava ku em li jiyanê di rewşa niha de dinerin sed û heştê pileyî hatiye guhertin…!

li celda û bazaran nema tu pêrgî dost û hevalan dibe, beyanî ji me pirtir bûne, civat û simîner kêm bûne, lêborîna ji hev nema heye, maye ku em di bin qorzîkên çavan li hev binerin nema em ji hevdû hez dikin, nema em radijin barê ser milê hev. Heta ji me tê em barê hev giran dikin, her û her em li hev û mehna digerin, her em dixwazin berpêka didin ber hev, daku em hev bidin erdê, her em davika li ber hev vedidin, pîlanê me pir bûne, ji bo hev xêrnexwaziya me ji xêr xwaziya me bêtir e.

çima ev bûyer tên serê me? ji ber ku em pir bi kesayetiya xwe ve girêdayî ne, ezeziya me pir bûye, em berjewendiyên xwe yên taybet di ser berjewendiyên millet re digirin, pir kes ji me hene dixwazin bilî xwe di bin simê hespên xwe de biperçiqînin. Çima pirê me ji welat derketine û welat vala kirine? Gelo sedem çi ye..!? Çima em ji hev hez nakin.. Barê hev giran dikin.. Barê giran li hev par nakin.. Em fikir û ramanên hev qebûl nakin.. Rexneyan qebûl nakin…Em mehna û pîlana li hev dikin.. û çima em çala ji hev re dikolin..!?.

Li gor nerînên xwe, gereke em berjewendiyên xwe yê taybet deynin rexekî, û li pey berjewendiyên millet bikevin. Em milletê xwe bi xwe ve girê bidin, em nehêlin millet dûrî hev bikeve, gereke bi awayekî em millet bigihînin hev. de ka em li vê nimûneyê binerin, gava şerê Vêtnamê û Emerîka negiha sed hezar kes ku ji Veytnamê nereviya û derneket, gelo çima? tevan şer kir û welat bernedan? bersiva vê pirsê bi kurtayî ez dikarin bêjim; ji ber ku bi xweşî bi reşî, birçî, tî millet bi hevr e bû (Mehmûdkî Otmankî) nebû, ji ber vê yekê biser ketin. ev gotara min gelekî dirêj e lê heta vir û hew. ya dawî banga min ji hemû partî û rêxistin û saziyên kurdan re heye, bi yek bin destê xwe bixine destê hev, milletê xwe li xwe kom bikin, wan ji xwe dûr nexin, fikir û ramanên xwe bikin yek, dûr bin ji şerê biratî. bibin yek êdî bes e penaberî em westiyan!!.

Ji Me Tevan Re Derdikeve



Kes ji ber berpirsiyariyê nereve û xwe ji ber xwe û mal û welat û çarenûsa herêma xwe, xwe mede alî, ji ber ku em jê ne û wê her rojek bêt ku êdî em careke dî lê vegerin, û heger ne em bin wê helbet zarok û neviyên me bighêjin vê serdemê ku xwe tê de êdî serbest bi welat û xêr û bêrên welêt bibînin.

Lê ne ji ber van gotinan ez vê nivîsarê ji we re li ber çavan radixim, bêhtir ku min dixwest êdî ez careke dî berê xwe bidim ciwanên kurd, xort û keçên me yên ku îro li welatên Ewrupayê rûdinên, yên ku ev salek wan û yên ku ev pênc û şeş salên wan li van welatan, ka hûn çi dikarin bikin..? Ka hûn çi dikin..? Ka êdî em ji hev bipirsin, bê em li vir li nav van xelkan li çî xwe digerin..? Ez ê dûr neçim û ez ê bînim ser rewşa xort û keçên me û bi pirranî xortên ku li Elmaniyayê nişteçî bûne û li vir mafê rûniştinê bi fermî sitandine.

Ji we re derdikeve îro roj ku hûn li zankoya bixwînin, bixwînin û bibin bijîjek, berfedêr, û endezyar û ji xwe re û ji welatê xwe re bibin her tişt, hûnê sibe vegerin û wê welat destê alîkariyê ji we bixwaze, jiyan ne bi tenê şer e, em tev YPG û Pêşmerge ne lê bi hawekî din, ji we nehat hûn bixwînin li zanko û dibistanên mezin û ekadîmiya, berê xwe bidin kar û fêrî kara bibin, kes ji min re mebêje çênabe û bi dest me nakeve, ji we tevan re derdikeve û hûn tev de jî dikarin bibin xwedan kar û hûnê ji xwe sibe vegerin, wê welat jî bi rola xwe destê alîkariyê ji we bixwaze, hûn xwe li van welatan baş û dirust ava bikin, ji van welatên pêşketî sûdeyê werbigrin û derfetên ku îro roj ji we re li van welatên Ewrupî derdikevin û bi taybet li Elmaniyayê derfetên ji zêrin û wê hew bi dest we bikevin ku hûn îroj xwe bernedin nav xwendin û fêrbûna kar û baran.

Hûnê vegerin, lê zana û xwedan kar û xam vegerin, da ku hûn xelk û qadê bi avahî û zaneyariyê bixemilînin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Ji Orojînî Bipirsin

Ji ya xwe em nayêne xwar
Em in hilgirê sûnd û bar
Em in pêşengê mirovan
Em in Kurdoxê saziman
Em in Horî tev pêt û ar
Xwediyê jî, roy, û çinar
Me heye nav û deng û zar
Me heye vîn û şêrîn yar
Em in Kurd û ev nîştiman
Me heye derd û ev derman
Serê xwe me nedanî xwar
Nîşan dikin bexçê gulzar
Me heye mêjûya cengan
Em in serdarê herdeman
Me çêkir ev text û biryar
Me lêkir kelat û dîwar
Lengerê jiyînê em in
Ji Orojînî bipirsin
Ji warê me deşt û pesar
Buhar û xurista hedar
Em in gundî û şaristan
Çêkerê berhem û kedan
Gelî û ziving û zinar
Zevî û peravên bi dar
Em in pêdarê serdeman
Em in gelê Mad û Botan
Pasvanê tixûb û beyar
Xwebexşin dilzos û dildar

Hesekê

Miş`el Osman

Li jor
Heyv tovên bîranînan geş dike
deÛ balafir jî di tariyê
Dastanên wêranbûnê dirêse
Stêrkan vedimirîne
Bajar vala ye...tengezar e...
Dergeh girtî ne
Ne çivîk
Ne kevok
Pisîk li kolana jar û mest in...
Hechecîk hêlîn hiştine
zarok li pey goga tirsê
Xwê didin
Ma ev çi dunya ye loo
Bazirgan me zorga kirine
Di rojê de sed carî me dikujin loo
De ka em dewranê vegerînin
Mêrxasekî digot :
Em ê wan bikin bênder
wan bişewitînin
tenê wê poz li jor bimîne
gelo çend siwar di vê toşê de
loobêmirad çûn
Karwanê herî dawî
buhar û
Ew qirşika bitenê dizîn
Û çûn
Li ser sînor xewna azadiyê
raxistin
û çûn
Ji mêj ve çemê Xabûr û Ceqceq
Nema xumxum ji wan tê
Bo çavên ku ziwabûne
Jiyan nema xweş e loo
Her şev sî û sê gulle
Ser gulên çelmisî dibuhire
Û tirafa darê qizwana
Ji çiyayê Homan
Digihêje Kewkebê Mila
Dengê şûr û mertala
Brahîmê Paşê şiyar dike
Derwêşê 'Ebdî li deştê winda dibe
Fermana dihejmêre...
Qêrîna 'Edûlê erdê diqelêşe
Kêra xiniz di dest de
Bo viyana dijwar dibêje:
Ji te hez dikim Derwêşo
Ji te hez dikim welato
Û ji bo roka di nivê alê de
Vane şervan nehtorê çem û çiya ne.

Xanî danî, Feqî danî
Te hilanî li hev anî
Te dur ji behrê deranî
Bi rastî jî, tu hozanî
Te textê xwe, li dil danî
Ji dil anî li dil danî
Te kir almast û hê danî
Bi rastî jî tu hozanî
Te deng bakir bi mêranî
Te kurdî rakirî banî

Tu sultanî tu sultanî
Bi rastî jî tu hozanî
Aram te kir bi şêranî
Zimanê Feqî û xanî
Bi zarê xweş bi rêzanî
Bi rastî jî tu hozanî
Me cih danî li en banî
Me navê te li ser danî
Li rû Mîr ê Bedirxanî
Birastî jî tu Hozanî

Min Bawer Nedikir

Min bawer nedikir rojekê tu yê
Ji min dûr bikevî wek
ewrên li ezman
û ez ê di agirê bêrîkirinê de
bişewitim mîna şemalek vêketî
di her êvaran de
ez ê gazî te bikim
tu yê bibî stêrek çirisandî
di şevên havînan de
bi xemsarî
ji ber çavên minî
xilmaş bûyî winda bibî

* * * *

Bi her bablîsokek payîzê re
wê landika dilê min
li babibe
bi gernijînek lêv girî
wê wêneyên te ji dara dilê min
bi pelên zerbûyî re
biweşin
li ser qiraxa çemê xweziya
* * * *
Min bawer nedikir rojekê tu yê
ji min dûr bikevî
Û ez ê bibim hêsîrê evîneke
kolan bi kolan
bi pey xewnên beravêtî bikevim
bibim parsekek
li ber deriyên kozikên
koçberbûyî
rondikên çavên xwe ziwa
bikim
li hêviya rojên nepen
* * * *

Bi Tenê Mam

Kaçiya Osman

Hêdî hêdî ro diçû ava... dûr diket û ew bi tena wê dihişt li ser wê pirê tu kes li kolanan tunebû ew bi tena xwe dimeşiya. . Ji nijkava dengê giriyekî ji dûr ve hat, Rewşê Li cihê xwe rawestiya çavê xwe vekirin û li hawîrdora xwe nerî, lê tu kes nedît hêstir ji çavin wê bariyan weke pelê dareke payîzî û bang kir bi êş Ayhan tu kanî Ayhan ez bê te najîm..!
Bi qêrîna we pêlin avê xwe li kevirê keviyê xistin bi xurt û ew kevir şkandin.
Rewşê rûniştû çavin xwe girt û çû duniyake dî, gava ku Ayhan bang kir pê: Dayê min pir bêriya bavê xwe kiriye, ez duxazim biçim cem wî dayê, bavê min li ku de ye.. Çima venagere male..!?
Rewşê nema zanîbû çawa bersiva kurê xwe bide, çawa jê re bêje bavê te yê dev li ken, bavê te yê ku jiyanekî bi taybet ji te re amade kir bû çû û kesin têrorîst jiyana wî dizîn di şevek reş û tarî de. Ayhan bang kir: Dayê çi bû tu çû kû??
Rewşê got: Belê Kurê min … Bavê Te çûye ezmana, cihê wî pir ji vê derê xweştir e.
Ayhan: Çima me bi tena me hişt ez jê xeyidîm..!
Rewşê: Na kurê min, çênabe zarok ji bavê xwe bixeyidin.
Ji bo Rewşê Ayhan ji rewşa êşê derxe pê re keniya, û got: Ka em harin parkê mane te got ez dixwazim bi hevalin xwe re bilîzim.
Ayhan kêfkir û bang kir: Belê Dayê
Ji kêfa re, Ayhan wek periyekî di nav hevalin xwe de difiriya.
Di wê roja buharî ya ku bi kenin zaroka hatibû xemilandî weke sitêrkin bi şewqa xwe reşaya şevê dikirin ronî.
lê mixabin ewrek reş hat ew runî vemirand
bi dengê Teqînê dest û lingê Rewşê Kelepçebûn nema zanîbû çawa rabe ji cihê Xwe
gava li ber çavê Wê qetin kurê Wê belavbûn li ezmana weke baskê Perperîkin firiya li ber ba
rahişt kurê Xwe bi hewara dayikek dil şewat himbêzkir û bêhna mirinê Jê kir
bazda li cem jinekê û destek qetiyayî ji himbêza wê kişand bi xwirtbûn û bankir pê ev destê Kurê Minê çima te rahiştiyê
Rûniştli cihê Xwe û kurê Xwe hilda ezmana li ser destê Xwe û bankir bi qêrîn
Vaye te kurê Xwe jî bire cem xwe û we min bi tena xwe li vir hişt ka ezê Bi kude biçim ez mam weke teyrek bask şikestî
Hun hêviya min bun û ez bê hêvî mam çima
Bi qêrîna çima Rewşê Bi hiş hat li hewîrdura xwe geriya lê tu kes nedît ew bi tena xwe avêtiybû li ser wê pirê Di reşaya şevêde lê xeyalek ji durve xwiyakir
Bi cilin sipî weke runiyê Ji wan derdiket
Rabû û nezîkî wan bû bankir Ayhan Amed ev hûnin
Dengê Kenê Ayhan hat û got belê Dayê ev emin ez û bavê Xwe me pir beriya te kiriye û em hatin te jî bibin cem xwe
Bi lez rewşê Bi rihê Xwe çû cem wan û laşê Xwe hişt avêtî li ser wê pirê Bi tenê

Zengî Careke Dî Pirtûkên Xwe Çap Dike û Diyarî Gelek Navend û Dezgehan Dike

Di vê mehê de nivîskar û ronakbîrê kurd Dilawerê Zengî dest bi çapkirina berhemên xwe yên ku berî niha carekê û diduyan hatine çapkirin, Zengî dest bi 12 pirtûkan kir, û piştî dûbara çapkiirna wan pirtûkan, diyarî piraniya dezgeh û navendan kir, ji wan jî Rojnameya me "Bûyerpress" bû. Em çapa nû, û gava nû ji mamoste re pîroz dikin. Berhemên ku hatine çapkirin ev in:

- Berî Heyv Hilê -çîrok- wergerandina ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî Tewfîq El-Huseynî. weşanên Mîdiya-Erbîl 2001. Çapa diwemîn Beyrût-libnan 2010. Çapxaneya Emîral.
- Şerrên Sasûnê, Osman Sebrî, komkirin û amadekirin bi zimanê kurdî 2005. Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral.
- Dîroka Kelepora Mîrnişîniya Botan. Mele Xelefê Bafî, veguhestina tîpan bi zimanê kurdî 2005, Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral.
- Qedrî Can, Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin.- amadekirin û berhevkirin, bi zimanê (Kurdî). Çapxana Emîral, Beyrît- Libnan 2005.
- * وژن للعشق dîwanek ji helbestan- wegerandina:Şêx Tewfîqê Huseynî. Weşandina Dar Kîwan, Şam2005.
- أطياف الماضي Beyrût, Libnan. Çapxaneya Emîral2009.
- Bînahî- (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), Beyrût, Libnan. Çapxaneya Emîral 2010.
- Bîranînên Celadet Bedirxan, komkirin û Amadekirin bi du zimanan Kurdî û Erebî. Beyrût, Libnan 2010. Çapxana Emîral.
- Ebdulrezaq Bedirxan, wergerandin bo zimanê Erebî, çapxana: Emîral, Beyrût, Libnan 2010. Çapa diwemîn 2015.
- Osman Sebrî (Jiyan, Tekoşîn û Berhem) 1905-1993. Bi herdû zimanan kurdî û Erebî. Çapxana Emîral, Beyrût, Libnan 2012.
- Çîrokên Gelerî (Ji efsaneyên kurdî) Danheva: Rojê Lîsko, ji zimanê kurdî wergerandin bo zimanê Erebî. Bi alîkariya Tewfîqê Huseynî. Şam, 2010. Çapek taybet.
- Çîroka Alaya Kurdî, Daner:D. Zengî. Çap:Yekemîn. 2012. Qamişlo.
- Kurd û Kurdistan (كرد وكردستان عبر أسفار التاريخ), Çapa yekem Qamişlo 2014.
- Zimanê Me, Daner: Çapa-Yekem 2015Qamişlo.

Li ser wê rêya dirêj
Ya weke koçên Enfalan
Dawiya wê nayê
Te pişta xwe dabû min
Û tu diçûyî

Şev hemû bendewarên
Hatina te ne
Tu bi xwedêkî
Were
***
Lehî
Dilê min şeveke tarî bû
Hemû stêrk tê de
Vemirî bûn
Tîrêjên berbangê
Weke lehîyeke xurt
Şev da ber xwe

Evîna te jî
Bi xwe re bir
***
Pêrgîn
Her êvar
Stêrk di hembêza ezman de
Vêdikevin

Her buhar
Gul di dilê xunavan de
Şîn tên

Tenê her bêrgîn
Destên min
Di nav destên te de
Têne kuştin
***
Rê
Rê ji min re
Hembêza janên xwe
Vedikin
Di her evînê de dibim
Rêwî
Û di her rêyê de
Winda dibim
Tenê
Çavên te
Min ji kûraniya windabûnê
Vedigerînin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Di tekoşîna azadîya kurdan ya bi dehan salan de yek ji pirsgireka mezinew bû ku me nedikarî "derdê xwe" ji raya gîştî ya cîhanê re bibêjin. Kesekî bi qasî me tekoşîn, merxasî û bedelên mezin nedanê, lê xelk dengê me nabîhîst û gelek me bi awayekî din dizanin… Yek ji sedêma wê jî nebûna alavên me xwe bigîhînin mirovahîyê ye.
Li Swêd jî ew pirsgireka me hebû û heye. Lewra em zimanê Swêdî wekî têyî xwestin nikarin bikar bînin. Lê birêz Kemal Qoserî ew yeka bi penûsa xwe şikand û sê pirtûk bi zimanê Swêdî nivîsandin. Pirtûka yekêm dû heftan berê derket û eleqeyeka mezin dît.
em wî pîroz dikin û dixwazin kefxwaşiya wê bi xwendevan û dostan re parva bikin.

Peyva wendayî

N	P	Ê	Ş	P	I	R	C	K
E	D	I	B	I	N	Ê	Ş	E
B	D	E	S	T	Ê	E	D	S
Î	Û	G	D	Ê	E	R	I	P
X	W	B	I	D	I	N	B	E
E	M	R	A	Y	E	N	I	Y
H	E	R	D	E	M	Î	N	D
N	A	Ç	E	D	E	R	D	A
X	W	E	N	D	I	N	N	?

Xwendin nebî kes naçe pêş
Peyda dibin pir derd û êş
Herdem di bin destê neyar
Em dê bidin.....
Peyva wendayî 9 tîp in, navê afrênerê vê helbestê ye.

Hejmara bûrî

Rojava

kurdî

Xweş e

Pêspêr	مفوّض
Peydakirin	توفير
Pilandan	تخطيط
Piraktîk	عمليّ
Pirkêşî	إصرار
Pirtekaxez	قصاصة
Pîşewerî	احترافي
Pişik	رئة
Piştgermî xwespartin-	ـ اعتماد (الرأي

Ciwanên Kurdistanê Bûne Lehengê Norway Cup 2015

Tîma ciwanên Kurdistanê di yariya dawî ya lehengiya Norway Cup 2015 de li hember tîma Hormindall serkeft û bû yekemê turnuvayê.
Tîma hilbijardeya ciwanên Kurdistanê di lehengiya Norway Cup 2015 de bû leheng. Di yariya dawî de îro tîma ciwanên Kurdistanê li hember tîma Hormindall a Norveçê, di encama lêdana penaltiyan biserket û bû leheng.
Di dema asayî ya yariyê de herdu tîm golek bi golek yeksan bûn û gola tîma Kurdistanê yarîzan Karzan Mistefa tomarkir.
Hilbijardeya Kurdistanê bi vî awayî cara yekem bû lehengê turnuvayê.
lehengiya Norway Cup salane li welatê Norwêçê bi beşdariya bi dehan tîm birêve diçe. Eve cara çareme ku Kurdistan başdarê Norway Cup dibe.
Tîma Kurdistanê par jî bibû duwem. Jêder: basnews

Hiş û Aqil Di Pendên Kurdî De

Tu bi hiş be, wê xwarina te ne rij be
Ê nebîne reşiyê , nabîne xweşiyê
Aqil û mal kirin bez , vî go ez û wî go ez
Aqilê hişk û stûr, pêş xwedî dike riya dûr
Aqil di serî deye ne di dil deye
Aqil taca zêrîne , li ser serê her kesî nîne
Aqil nayê kirîn û firotin
Aqilê te hebe wê xizanî dûrî te be
Aqilê sivik barê giran

Xaçerêz

ASOYÎ

1.Ji bo bersivê, xortê biçûk.
2.Cureyekî tilûran (vajî), xanî.
3.Gotinên veşartî, daçek (vajî).
4.Ji bo pirsa kes, jêdereke avê ye (vajî).
5.Ji nîşankirina nêzîk, hejmarek e.
6.Gulistana mîrê botan, tayên pîrepîrê.
7.Rêxistineke siyasî, ji bo erêkirinê (bi zimanekî biyan).
8.Xeyala ku li ber roniyê çêdibe(vajî), komek sewal (vajî).

STÛNÎ

1.Temen mezin.
2.Lehengê dîrokî yê kurdan (vajî), Tiştê ne germ be (vajî).
3.Cînava kesê yekem, temen (bi erebî).
4.Wekhev, cînaveke nîşankirinê tewandî(vajî), bê av.
5.Bo gelekjimara lîkeran, çekeke cengê kevnar.
6.Tiştê her roj dibe.
7.Daçek (vajî), cureyeke tilûran.
8.Ji pêkhatên çîrokê, hinek (bê dengdêr).

	1	2	3	4	5	6	7	8
1			■					
2	■				■			
3				■			■	
4			■					■
5		■			■			
6				■				
7						■		
8			■					■

Hejmara bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	A	P	■	B	Û	Y	E	R
2	■	S	T	Û	■	E	E	E
3	D	Î	T	■	Û	K	■	M
4	O	K	■	A	R	Î	Ş	E
5	T	■	A	D	■	N	Ê	Z
6	M	A	R	■	N	Î	R	A
7	A	Ş	Î	T	Î	■	Î	N
8	M	E	M	Û	Z	Î	N	■